
Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1120 | 26-Mijdar- 2023 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
423165

# Hejmara 4'mîn A kovara Afaq Almeraa Derket




**Nêrgiz Ismayîl**

Kovara Afaq Almeraa hejmara xwe ya çaremîn çap kir. Naveroka hejmara çeremîn li ser Bîrdoziya Rizgariya jin e. Îdeolojiya azadiya jinê hêza çareseriya hemû pirsgirêkên heyî yên civakê ye. Îdeolojiya azadiya jinê li Kurdistanê û bi vî awayî li Rojhilata Navîn rê vekir ku felsefeyeke nû ya jiyanê ku tê de azadî û edalet serdest be û bi vî awayî qada têkoşîna rizgariya ji neheqiyê û daxwaza mafên rewa bê afirandin. Pêwîst e hemû jin karibin vê felsefeyê di dema me ya îroyîn de biparêzin û bi vî awayî li hemû jinan belav bikin û rê û rêbazên guncaw ku çareseriya herî bi bandor in ji bo hemû pirsgirêkên heyî yên di civakê de bi kar bînin. Pirsgirêka jinê ya ku beriya ku bi zayendek an jî ferdekî civakê ve girêdayî be, pirsgirêkek civakî ye, dema ku were çareserkirin, wê gelek kompleksên serhişk ên 5 hezar salî yên weke mîrateya xwe mane çareser bibin.

Dirûşma "Jin, Jiyan, Azadî" şoreşeke mezin e û ev şoreş ji bîrdoziya azadiya jinê û koka felsefeya (Jin, Jiyan û Azadî) derketiye. Ya rast ev e; Ger jin azad nebe civak jî azad nabe. Helbet ramanwer û rêber Abdullah Ocalan di esasê azadiya civakê de fikra azadiya jinê ava kir, ji bo Tevgera Azadiya Jinên Kurdistanê mijareke stratejîk bû û encama wê têkoşîna efsanewî bandoreke erênî li ser kir. Jin û rêwîtiya wan a dûr û dirêj a tevlêbûna hemû dozan, îspat dike ku ew hêza bingehîn û pêşeng a avakirina civakê ne...

Civakek tijî zihniyeta jin-dayik. Belkî gelek partî bi feraseta moderniteya kapîtalîst ve girêdayî ne; Rizgarî û baştirîn çareserî ye ji bo gihiştina civakeke azad û îdiaya ku dema îdeolojiyan derbas bûye, lê li vê cîhanê ti pêşniyar û têgehek bê îdeolojî nîne. Her pergal li ser îdeolojiya xwe ava bûye û li ser wê pêş dikeve. Ji ber hilweşîna sosyalîzma avakirî, têgînên kapîtalîst ji bo îdeolojiyê weke marjînal, neyînî û dij-civakî nîşan bidin, gelek hewl dane, lê dema ku pergala kapîtalîst vê yekê dike, bi awayekî sîstematîk û bi zanebûn êrîşeke îdeolojîk dike. Heger ev teorî neyê guhertin û bi vî awayî fikra ku (ferd û jin) bê îdeolojiya xwe ya rast bijîn, wê demê mirov nikare di nava jiyan û şêwaza ku dixwaze de bijî, wek mînak. Di nava jiyaneke ewle, hezkirin, edalet û demokrasiyê de dijîn. Rastî bêyî îdeolojiyê em ê nikaribin li gorî feraseta rast a vîna azad a civakê bijîn.

Loma di hejmara me ya 4 mîn de me xwest vê mijarê bi awayeke berfireh şîrove bikin, û pênaseya wê ya rastînin bidin nîşandan. Ji ber ku; Îdeolojiya azadiya jinê; Li dijî zilma li ser jinê destwerdana şoreşgerî temsîl dike, ji bo rakirina zîhniyeta bêtehamuliya zayendî û zimanê çewt a bi hezaran sal e hatiye avakirin û hewldana sererastkirina wê ye. Îdeolojiya azadiya jinê ji bo gihandina zihniyeta moderniteya demokratîk asoyên nû ber bi avakirina rast ve vedike, ku bingeha wê jî jinên xwedî zanebûn û xwedî erkên dîrokî ne.

# Awazek ji dengê gerîlaya şehîd Sema Marînos





Gerîla TV'yê awazek ji dengê gerîla Sema Marînos (Vahîde Kurt) weşand ku di sala 2018'an de li Colemêrgê di êrîşa hewayî ya dewleta Tirk a dagirker de şehîd bû.

Kurte awaza li Gerîla TV'yê hatiye weşandin, ji aliyê gerîlaya şehîd Sema Marînos ve tê gotin.

Awaza ku dilsoziya axa Kurdistanê nîşan dide bi taybetî ji bo herêma Serhedê hatiye nivîsandin. Di awazê de tê gotin ku herêma Serhedê warên gerîlayan e, bedewiyên wê yên xwezayî bi dengê gerîla Sema Marînos zindî dibe.

Gerîla Sema Marînos di 21'ê Tîrmeha 2018'an de li herêma Geliyê Marînos a Colemêrgê di êrîşa hewayî de tevî 7 hevrêyên xwe şehîd bibû.

# Pêlava herî kevin a Ewrûpayê li Spanyayê bûye




Li gorî analîzeke nû, pêlava herî kevin a li Ewrûpayê hatiye tesbîtkirin, hatiye piştrastkirin. Li gorî lêkolîneke ku encamên wê nû di kovara Science Advances de hatin weşandin, 22 şimikên/pêlavên weke zembîlan hatine hûnandin, qederê beriya bi 6 hezar salan hatine çêkirin. Ev yek bi analîza radyokarbonê ya lêkolerên Zanîngeha Xweser a Barcelonayê û Zanîngeha Alcalá li Spanyayê derketiye holê.

Tevî van pêlavan, zembîlên serdema Ewrûpî ya mezolîtîk, tevî hin amûrêmn din, cara pêşî sala 1857´an li Başûrê Spanyayê gava ku karkerên kanan şikeftek talan kirin, hatibûn dîtin. Lê di salên 1970´yî de gava ev tişt hatibûn sinifan din, ew wekî berhemên beriya hezar salî hatibûn sinifandin.

Li gorî lêkolîna nû, şert û mercên pir zuwa yên di nava şikeftê de kirine ku materyalên wan baş bê parastin. Ji bilî zembîlan û pêlavan hin amûrên darîn jî bi vî rengî 6 hezar salan karîne bên parastin.

Sudoku: Bersiv 31

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 5 | 1 | 4 | 9 | 2 | 7 | 6 | 3 | 8 |
| 6 | 2 | 7 | 3 | 8 | 5 | 1 | 4 | 9 |
| 8 | 3 | 9 | 4 | 1 | 6 | 5 | 2 | 7 |
| 2 | 6 | 1 | 7 | 5 | 8 | 4 | 9 | 3 |
| 7 | 4 | 8 | 6 | 9 | 3 | 2 | 5 | 1 |
| 3 | 9 | 5 | 1 | 4 | 2 | 7 | 8 | 6 |
| 9 | 7 | 2 | 8 | 6 | 4 | 3 | 1 | 5 |
| 4 | 8 | 6 | 5 | 3 | 1 | 9 | 7 | 2 |
| 1 | 5 | 3 | 2 | 7 | 9 | 8 | 6 | 4 |

Sudoku:Pirs 32

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | 2 | | | 9 | | | |
| | | 1 | | 6 | 4 | 8 | | 5 |
| | | 6 | | | | | 3 | |
| | 1 | | 9 | 5 | | | 2 | |
| | 8 | | 6 | | 7 | | 5 | |
| | 2 | | | 1 | 8 | | 7 | |
| | 6 | | | | | 5 | | |
| 3 | | 5 | 1 | 9 | | 2 | | |
| | | | 3 | | | 6 | | |

# FERHENGA BIWÊJAN

**Ji xelkê re adet e ji min re qebahet e:**
- Her kes dike ti kes dengê xwe nake, lê dema ez dikim min rexne dikin.

**Keviran diavêje me/beran diavêje me:**
- Bi awayekî sergirtî me rexne dike.

**Li ber çavê te nayê:**
- Tiştên baş yên ku ez dikim tu nabînî, tu naxwazî bibînî, tu qîmet nadiyê, çawa ku min nekiribin.

**Li min xweş tê li te xweş tê, ev çi ard e li wê teştê:**
- Hem bi dilê min e, hem bi dilê te ye, wê demê çima tu heq dixwazî? (3)

Ma kevir di dilê te de ne?
- Divê tu wisa ne dilreq bî.

**Ma serê te çi jê diêşê:**
- Tu çima tevlî wî karî dibî?

Ma polên te firiyan?
- Ma te alîkarî bi me re kir çi qewimî?

Ma lingên te ne bi te ve ne?
- Ji xwe re bixebite, tu çima betal dimînî?

Ma kevir bariyan?
- Te alîkarî dayê baş bû, ma çi qewimî?

**Mala Xwedê ava:**
- Dema yek li bendê be ku tişteke xirab biqewime, yan tişteke xirab bihîstibe, lê wisa dernekeve hingê dibêje. Dema mirovek li benda yekî be, lê dereng were, yan karê xwe dereng biqedîne, hingê jî dibêje. Aciziya xwe, dilnexweşiya xwe tîne ziman. Bi awayekî sergirtî rexne dike.

**Ma te kulav xwendiye:**
- Tu çima nizanî; tu çima bersivê nadî; tu çima naaxivî?

**Ma min kulav xwendiye:**
- Çima hûn ji min bawer nakin; çima hûn guhê xwe nadin min? (Dema yek xwe zana bizane lê ti kes guhê xwe nediyê, yan jê bawer nekin hingê dibêje)

**Ma kuliyê zimanê te xwariye:**
- Tu çima dengê xwe nakî. (Dema yek ji şerma, yan ji ber tişteke din naaxive hingê jê re dibêjin)

**Ma agir bi mala te ketibû:**
- Dema pêwîst be yek tiştekî bike û neke hingê jê re tê gotin.

**Ma ava reş di çavê te de hatibû:**
- Bi heman wateyê.

**Ma ava reş hatibû ser çavê te:**
- Bi heman wateyê.

Ma destê te ne bi te ve ye?
- Ma çi bi te hatiye tu naxebitî diçî parsê dikî?

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

# 25'ê Mijdarê roja çirandina kefenê mirinê



Roja 25'ê Mijdarê Roja Cîhanî ya Tekoşîna Li Dijî Tundiya Li Ser Jinê, ev rojê bingehê xwe ji têkoşîna xwişkên Mîrabel digire. Patria, Minerva û Maria Teresa li Komara Dominik çalakvanên siyasî bûn û li dijî pergal û siyaseta serokê komarê Rafael Trujillo serî hildabûn û têdikoşiyan. Di 14'ê Hezîranê de di dema şahiyê de Rafael Trujillo hewil da ku Minerva yê tacîz bike, loma Minerva helwesta xwe nîşan da û şeqam li Rafael xist.**R-2**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1120 | 26-Mijdar- 2023 | www.ronahi.net/ku/

# PKK'Ê PARTIYA ŞEHÎDAN E VEJÎNA JIN Û GELÊN BINDEST E

PKK'ê di 27'ê Mijdara sala 1978'an de li gundê Fîse yê Licêya Amedê hat damezirandin. Tevgera azadiya Kurdistanê PKK'ê, di serdemekê de ku gelê Kurdistanê li ber tinekirinê bû, di pêşengiya Rêber Apo û çend hevalên wî de derket holê. Bi derketina tevgera APOYÎ re, roj bi roj ronahî geşbû û hêviya azadiyê xurt bû. Bi ked û têkoşîna Rêber Apo û lehengên serdemê, doza azadiyê ya ku êdî qet bi bin nakeve, hat tacîdarkirin.**R-4**



# Amedekariyên Rêveberiya Xweser ji bo kampan



Rêveberiya Xweser her sal beriya werzê zivistanê, ji bo kempan dest bi amadehiyên dike û hewil dide tevahî pirisgirêkên kampan çareser bike. Rêveberê Ofîsa Karûbarên Koçberan û penaberan Şêxmûs Ehmed li bakur û rojhilatê Sûriyê bang li sazî û rêxistinên navneteweyî kir ku destekê bidin kampên bakur û rojhilatê Sûriyê.**R-6**

# Radyoya Yêrîvanê




Di sala 1955'an de dema ku Radyoya Yêrîvanê bi dirûşmeya 'Yêrîvanê xeber dide, guhdarên ezîz, niha bibhîzin deng û behsên teze' dest bi weşanê kir, kesî bawer nedikir ku ji bo mûzîka kurdî wê bibe akademiyek bê ser û ber. Ji roja avabûna radyoyê vir de hê jî bi zindîbûna roja xwe ya ewil di bîra kurdan de cih digre.**R-7**

Hafiz Ahmet Turhalli



**Mislman û tundiya li dijî jinê** R-6

# 'Em ê asta têkoşîna li dijî tundiya li ser jinan bilindtir bikin'

Rêvebera Rêxistina Sara ya têkoşîna li dijî Tundiya li ser jinan diyar kir ku ew ê asta têkoşîna li hemberî tundiya li ser jinan bilintir bikin, herwiha bang li rêxistinên jinan yên navneteweyî kir ku li hemberî sûcên dewleta Tirk û çeteyên wê yên li dijî jinan bêdeng nemînin.**R-5**




# 33 roj in Rojnamevan Silêman Ehmed winda ye

Ji Rojnamevan û edîtorê beşa Erebî yê ajansa me Rojnews'ê Silêman Ehmed ku ji aliyê PDK'ê ve hatiye revandin, 33 rojin agahî nayê girtin. Her ku diçe guman û fikarên li ser jiyana Silêman Ehmed zêde dibin, PDK rê nade ne parêzer ne jî malbat kesek hevdîtinê li gel bike. PDK ji ewlehî û jiyana edîtorê ajansa Rojnews'ê Silêman Ehmed berpirse.**R-3**



# 25'ê Mijdarê roja çirandina kefenê mirinê

Roja 25'ê Mijdarê Roja Cîhanî ya Tekoşîna Li Dijî Tundiya Li Ser Jinê, ev rojê bingehê xwe ji têkoşîna xwişkên Mîrabel digire. Patria, Minerva û Maria Teresa li Komara Dominik çalakvanên siyasî bûn û li dijî pergal û siyaseta serokê komarê Rafael Trujillo serî hildabûn û têdikoşiyan. Di 14'ê Hezîranê de di dema şahiyê de Rafael Trujillo hewil da ku Minerva yê tacîz bike, loma Minerva helwesta xwe nîşan da û şeqam li Rafael xist.

**Deriya Çiya/ Qamişlo**

Piştî wê bûyerê bi pêşengiya Minerva ku beşa Parêzerî li zanîngehê dixwend, rêxistina bi navê 'Tevgera 14'ê Hezîranê'ê ava dikin ku navê xwe ji dîroka şeqama Rafael Trujillo xwariye digire û perperîkê jî weke nîşaneya tevgerê hildibijêrin.
Piştî wê bi demekê Rafael Trujillo fermana dîlgirtin û îşkencekirina hersê xwişkan dide û Minervayê ji bawernameya wê mehrûm dike. Paşê hersê xwişk ji girtîgehê derdikevin û di 25'ê Mijdara 1960'î de bi rengekî hov ji aliyê çekdarên Rafael Trujillo ve têne qetilkirin. Ev bûyer dawiyê li pergala Rafael tîne û ew piştî 6 mehan ji qetilkirina xwişkên Mîrebal, tê kuştin. Komeleya Giştî ya Neteweyên Yekbûyî di 17'ê Kanûna yekemîn sala 1999'an de biryar didin ku 25'ê Mijdarê, roja qetilkirina xwişkên Mîrebal bibe roja cîhanî ya têkoşîna li dijî tundiya li ser jin û hemû hikûmet, rêxistinên navnetewî, rêxistinên mirovî û yên jin ji bo têkoşîna li dijî tundî û parastina mafên jin rol û misyonên xwe bilîzin.
Têkoşîna Xwişkên Mîrabel ên 59 sal berê hatin qetilkirin, berdewam dike. Beriya xwişkên Mîrabel û piştî wan jî bi dehan jinên li dijî dîktatoriyan li berxwedane hebûn. Ji Jeanned Arc bigire heta Fatma Kara, heta Clara Zetkîn, Leyla Qasim, Rose Luxemburg, Sakîne Cansiz û Hevrîn Xelef, têkoşîn û berxwedana jinan mezin dibe.

**Tekoşîna jina azad li hemberî hişmendiya serdestiya mêr**

Di roja me ya îro de zext û tûndiya li ser jinê tê meşandin, bi qasî ku berpirsê wê desthilatdariya dewlet û zîhniyeta zilamê paşverû ye, ew qas jî xetayê jina ne bêrêxistinkirî ye
Ji ber heta ku jin xwe bi rêxistin neke wê her tim bibe amûrek di destê dewletên faşîst û zilamê paşverû de. Lewma îro jin li seranserê cîhanê bûye amûrek fihûş, kirîn û firotinê. Yanî sedî salane rêxistinek dewletî û desthilatdar di civakê de hewl daye xwe bike hêza îxtîdarê, xwe bi sazî bike û ji bo hebûna xwe bide parastin, hêza civakê ya esasî û ya sereke jinê bi rê û rêbazên cuda bigire bin serweriya xwe, li gorî zîhniyet, serwerî û desthilatdariya xwe reng bidiyê û bide meşandin. Bi vî awayî hewl daye destwerdanê li cewhera jinê û hêza wê ya civakbûnê bike, her wiha li gorî xwe yan berevajî bike yan jî tine bike. Yanî xwestiye jinek li



gorî xwe û bi toreyên namûsê ve terbiye bike. Lê belê di her wextî de li hemberî zîhniyeta dewletê ya zilamtî, li hemberî vê zîhniyeta ku rastiya jinê berevajî dike her tim pêşengên tevgera jin a ku têkoşînê dimeşîne, serhildanê bilind dike, pêşengtî dike heqîqeta jinê parastiye. Lewra jin bûye temînata nirxên ku koka xwe ji dîrok û civakê digirin.

**Bûyerên kuştinê yên ku bala raya giştî kişandine**

Axaftvan, akademîsyen û edîtora kovara Jînolojiyê û endama Navenda Jîneolojiyê Nakihan Akarsal di 4'ê Cotmehê de li bajarê Silêmaniyê yê Başûrê Kurdistanê li ber deriyê mala xwe rastî êrîşa çekdarî hat û hat qetilkirin. Rojnamevana ku di gelek rojname û kovarên jinan de kar kiriye û gelek kedên wê hene. Nûçegihana Al Jazeera Şêrîn Ebû Aqla di 11'ê Gulanê de, bi guleyên artêşa Îsraîlê hatibû kuştin.
Kuştina Hana Xeder a Lubnanî hêrseke berfireh li Libnanê derxist piştî ku hevjînê wê di destpêka Tebaxê de agir berda bedena wê, ji ber nakokiyên malbatî ku ew rastî wan hatibû.
Aktîvîsta femînîst Cewhera Xanîfîs (28 salî) di 7'ê Hezîranê de li nêzî deriyê bajarê Şefa Amr ê li herêma Celîlê ya li Filistînê dema wesayîta xwe ya taybet bi bombekê bi otombêla wê ve hate qetilkirin. Di 29ê Cotmehê de kuştina Wefa El-Sebaî ya çil salî ji aliyê hevjînê wê ve, raya giştî ya Tûnisê hejand.

**Jin li Rojhilatê Kurdistanê û Îranê**

Jin pêşengiya şoreşa Îranê dikin û serhildana neteweyî ya gelên Îranê di 16'ê Îlona 2022'an de piştî qetilkirina jina ciwan a Kurd Jîna Emînî di dema ku ji aliyê Hêzên Erka Xweparastinê (Polîsên Ehlaqê) ve hatibû binçavkirin. Li gorî Komîteya Jinan a Encumena Neteweyî ya Berxwedana Îranê, di dema serhildana li seranserê welat de, hêzên ewlehiyê û pasdaran herî kêm 700 kes kuştin.
Nêzîkî 30.000 jin û piraniya wan di bin 25 salî de hatin girtin û di bin şert û mercên nemirovane de di girtîgehên qelebalix de hatin girtin û gelek işkence li wan hate kirin. Rejîma meleyan heta niha herî kêm şeş xwepêşander bi darvekirinê mehkûm kirine. Zêdetirî 61 jinên Îranî di encama lêdan û destdirêjiyê de mirin, di nav wan de jîna Emînî bi xwe jî, ku kuştina wê bû sedema gurkirina serhildana li Îranê û tevahiya cîhanê.

**Tundiya li ser jinan li Sûriyê**

Gelê Sûriyê ji destê hikumeta heyî gelek êş, azar, girtin, kuştin û pişaftin xwar. Di serî de ya ku herî zêde ji vê siyaseta ku hatî meşandin bandor bû jî jinbû.
Lê bi şoreşa 19'ê Tîrmehê re di serî de jina Kurd û tevahî jinên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê di hindirê şoreşê de şoreşek pêkanîn. Ji ber ku jinê cihê di nava hemû kar û xebata ku dihate meşandin de digrt û di hemû warên jiyanê de cihê di asta pêşengiyê de girt.
Jinê bi salên şoreşê re karî baweriya civakê bêtir qezenc bike û bandora xwe di serî de li tevahî jinên Sûriyê, Rojhilata Navîn û cîhanê kir. Tevî serkeftinên ku bidest xistiye jî lê heta niha pêwîstiya wê bi zêdetir têkoşîn û xebata li hember urf û adatên ku azadiya wê qeyd dike heye. Ji ber ku tekoşîna jinê ji bona azadiyê hîn berdewame û pêwîste ku jin karibe di serî guhertinê li cem xwe avabike, weke din jî hişmendiya mêr jî biguhere û bi vî rengî di civakê de jî guhertinekeî bingehî çêbike.
Ji ber ku hişmendiya zilamê serdest di her derî de hamime, sistemê hegemon û kaptalîst her tim jinê bikar tine û ji bona ku kiriye amû û meta û ji bona hemû çiqarên xwe yên gemar û qirêj bikartîne. Li gorî vê yekê pêwîst ku jin xwe li benda tu kesî nehêle û siberoja xwe bi destê zilam ve neberde û azadî û xelasiya xwe pêkbîne.
Hemû saziyên mafê mirovan yên qaşo bi navê parastina mafê mirovan û mafê jinan bang dikin, lê li ser erdê berûvajî wê yekê ew jî temsîla hişmendiya zilamê serdest û zagonên kaptalîzmê dikin. Ji ber wê yekê hemû kiryarên dijmirovî yên ku li hemberî jinê têne meşandin zagonên Sistema mêrperest wan rewa dibîne û hemû kujerên jinan bê hesab dimînin û kes dengê xwe ji wanre nake.
Serweriya çeteyên DAIŞ'ê li ser herêmê jî bandoreke pir xirab di serî de li ser jinê û civakê bi gitşî kir û di serî de bi hezaran jinên Êzidî hatin, qetilkirin, tecawizkirin, revandin û li bazaran hatin firotin. Herçiqasî ku çeteyên DAIŞ'ê di milê leşkerî de heyanî astekî hatibe şikandin jî, lê hîn hişmendiya wê hîn berdewame û carcaran jî bi hedefgritina jinên pêşeng û yên ku cihê xwe di kar û xebatên rêveberiya xweser de digrtin dixwaze hişmendiya xwe bi bandor bike û bandora tekoşîn û xebata jinê ya pêşengiya civakê bê bandor bike.
Li heremên dagirkirî jî rojane li dijî jinan kiryarên dijmirovî têne meşandin û guhertina demigrafîk bi rengekî sistematîk li ser axa Efrînê û hemû deverên hatine dagirkirin û li ber çavê cîhanê tevahî tê meşandin. Di serî de li Efrînê Hemû cûreyên tundiyê ji kuştin, revandin, tecawizkirin, qirkirina çandî, siyasî û hişmendî tê meşandin.
Bi rêbazên şerê teybet û derûnî yên ku di serî de dagirkeriya tirk, dewleta Sûriyê û hêzên kaptalîst li ser herema Bakurd û Rojhilatê Sûriyê bi gitşî û li ser jinê bi taybet dide meşandin armanca wê qirkirina civakê û ji holê rakirina destkeftiyên rêveberiya xweser e. Ji ber ku jin pêşenga civakê û pêşenga şoreşê ye û di hemû warê jiyanê de jinê xwe daye isbatkirin û baweriya civakê qezenc kiriye, hêzên desthilat û di serî de dagirkeriya tirk jinê dike hedef û dixwaze li hemû qadan û li her cihê ku tekoşîan azadiyê lê tê meşandin bê bandor bike. Dagirkeriya tirk bi riya belavkirina madeyên hişbir, fihûşê, sîxurtiyê û di hemû warî de bikaranîna jinan ji bona berjeweindiyên xwe, tekoşîan jinê ya ji bona azadiyê ji cewherê wê derxe û bê bandor bike.
Herweha di rewşa heyî de mirov dikare bêbêje ku tûndiya li ser jinê bûye gerdûnî û hişmendiya mêrê serdest dixwaze xwe li her deverî serweriya xwe pêkbîne û ji milê qnûnî de jî dixwaze kiryarên ku li hemberî jinê dide meşandin rewa bike û bi civakê jî di bin navê namûsê an jî hincetên din mafdar bibîne. Li Efganistan, Pakistan, Îranê û gelek welatên din jî, jin ji hemû mafê xwe yên bingehîn mîna xwendin û tevlîbûna nava kar û xebatên civakî bêpar dimîne û di bin navê nepêkanîna zagonên heyî de tê kuştin, girtin û işkence lê tê kirin.
Li hemberî van hemû kiryarên dijmirovî yên ku li hemberî jinê têne meşandin, jinê di asta pêşengiyê de, çarenûsa xwe xêzkirye û kefenê mirinê çirandiye. Di serî de jina Kurd û jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê û bi riya fikir û remanê Rêber Apo şoreşa civakî pêkanîne û li hemberî hişmendiya mêrê serdest rêxistina xwe avakirine.
Jin gihiştiye wê bawriyê ku ger ku ew bi xwe riya xwe ronî neke û asta tekoşîna xwe bilintir neke û dawiya hişmendiya mêrê serdest pêkneyîne, wê demê wê nikaribe bi rengekî azad bijî û wê serweriya mêr her li ser wê bidome.
Jinê û di dirêjiya dîrokê de hertim ji bona parastina azadî û rometa xwe di nava tekoşîn û berxwedanê de bûye û li gorî vê yekê jî roj bi roj asta tekoşîna xwe mezintirkî ye. Herwiha jinê di şoreşa Rojava de bi sekna xwe ya biromet di nava jinên cîhanê de dengvedaye û di serî de ji bona jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, Rojhilata Navîn û cîhanê bûye sembol û navnîşana berxwedan û azadiyê.

**Rêjeya tundiya li ser jinan li Bakur û Rojhilatê Sûriyê**

Sûcên ku di nava 6 mehan de ji 1'ê Çileyê 2023'an de û heta 30'ê Hezîrana 2023'an. li gor Kordînasyona Jinan a Bakur û Rojhilatê Sûriyê. Ku li ser jinê hatine meşandin bi vî awayî ne:
Hejmar cûreya doz / sûc
Kuştin 25
Zewaca temen biçûk 18
Pirbûna zewaca mêrekî bi gelek jinan 104
Xwekuştin19
Hewldana xwekuştinê 23
Destdirêjî 9
Heyrandin 1
Fihûş 13
Îxaneta hevjînan 5
Bikaranîna madeyên hişbir 12
Jinên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê rêya xwe ber bi azadiyê ve hilbijartine. Ji ber baweriya wê bi doza wê tê û xwesteka wê ew e, ku mafê xwe bidestbixe û dawiya siyaseta înkarkirin û qirkirina ku li dijî wê tê meşandin bîne û civakeke azad û wekhev avabike.



# Radyoya Yêrîvanê

Di sala 1955'an de dema ku Radyoya Yêrîvanê bi dirûşmeya 'Yêrîvanê xeber dide, guhdarên ezîz, niha bibhîzin deng û behsên teze' dest bi weşanê kir, kesî bawer nedikir ku ji bo mûzîka kurdî wê bibe akademiyek bê ser û ber. Ji roja avabûna radyoyê vir de hê jî bi zindîbûna roja xwe ya ewil di bîra kurdan de cih digre.

**Avesta Menaf/Qamişlo**

Piştî ku Radyoya Yêrîvanê bi anonsa xwe ya ku li Kurdistanê weke pêşgotinekê niştecih bû bi dest bi wêşanê kir, êdî kar û bar û jiyana rojane li gor seata wê dihatê organîzekirin. Ji berk u Radyoya Yêrîvanê ji bo kurdan bibû qonaxe hebûna wan ducar dike. Guherînên civakî li gor guherînên siyasî dereng dibin. Pirî caran pergela siyasetê civakê duguherîne û jê re pêşengtiyê dike. Radyoya Yêrîvanê piştî biryarek siyasî hatibe vekirin jî civaka kurd ji serî hetanî binî guherand. Dema radyoya Yêrîvanê di 1955'na de dest bi weşana xwe ya test kir, kesî nizanibû ku wê di mêjiyê kurda de cihek evqas mûhîm bigre. Dema radyo dest bi weşanê kir li tevayê Kurdistanê bêdengiyek giran hebû. Li bakurê Tirkiyê bi zext û zordariyek giran dihat ser kurdan. Li rojhilat Komara Mahabadê têk çûbû û hemû liv û tevger hatibûn rawestandin. Li başûr jî tevgera kurd di dema sekanê de bû. Rodyo di bêdengiyek bi vî rengî de deng veda. Di serî de heftê çar roj û rojê 15 deqe weşan dikir. Tenê di nava xaka Ermanîstanê de dihat bihîstin. Pişt re ji weşana test derket û bi rêk û pêk di mêjiyê kurdan de tehmek hevpar hîşt. Piştî wê dema weşanê derket her roja heftêyê. Bi roj seet di 4'an de, bi şev di seet 9'an de dibû mêvanê malên kurdan. Wê mêvanê bi xwe re "deng û basên" xerîb lê bi zimanek ji malê tanî. Di odê de cihê wê mêvanê herî jor bû. Zû bi zû firekans li ser radyoya Êrîwanê nedihat guherandin.

**Dîroka radyoyên kurdî**

Radyoya Bexdayê, di 19`ê Kanûna sala 1939`an de, dest bi weşana kurdî dike. Di serî de tenê 15 deqeyan weşanê dike û tenê kesekî bi navê Kamil Kakemîn di wê radyoyê de dixebite. Radyoya Bexdayê li tevayî Kurdistanê dihate guhdarkirin. Radyoya Yafa (Heyfa) li Filistînê di destpêka sala 1942'an de ji aliyê dewleta İngilistanê ve, li girava Heyfayê tê dameziran-din û çend rewşenbîrên kurd tê de dixebitin. Piştî ku şerê şerê cîhanê yê duyemîn bi dawî dibe weşana wê radyoyê jî tê rawestandin. Radyoya Beyrûtê di 5'ê Adara sala 1941'an de ji aliyê Dr. Kamuran Bedirxan ve hat damezirandin. Ew radyo beşek ji radyoya fermî ya Lubnanê bû û di nava hefteyê de tenê du rojan û bi qasî 30 deqeyan weşan dikir. Weşana wê radyoyê heya yekê nîsana 1946'an dewam kir. Radyoya Dengê Kurdistanê di 30'ê Nîsana 1946'an de dest bi weşanê kir. Ew radyoyek navçeyî bû û tenê li bajêrê Mihabadê dihat bihîstin. Bi hilweşandina Komara Kurdistanê, weşana wê radyoyê jî hate rawestandin. Di 24'ê Hezîrana 1952'an de li Sînê ji alî Îranê ve radyoyek bi kurdî tê vekirin. Piştî bi pêşketina teknolejiyê bi dehan radyoyên kurdî tên vekirin.

**Di radyoyê de rola jina**

Her çiqas ku wê demê di nava civakê de jin li paşbûna jî ku meriv li xebatkar û sitranbêjên radyoyê dinêre bi rehetî dibîne ku rola jinan a di radyoyê de ne hindik e. Meseleya dengbêjên jin pir zehmet bû. Birayên wan, hevjînê wan û malbatên wan nedihîştin ku ew di radyoyê de bistirên.
Tevî ku rewş wihabû jî bi saya rêvebirên radyoyê dengê wan dengxweşan wek bayek qedîm hê jî di guhê me de dike pistepist. Her wiha roja ku radyo hat avakirin vir de jina bi anvê Eznîva Reşîd 27 salan pêşengî kir. Li gel Eznîva Reşîd hin caran Sêvaza Evdo, hin caran jî Lusika Huseyn û Gulîzera Casim bêjertetiya radyoyê dikirin. Dengê hin dengbêj û sitranbêjên wek Aslika Qadir, Susika Simo, Xadina Şekir, Meyrem Xan, Asa Evdille, Belga Qado, Ayşe Şan, Fatma Îsa, Dîlbera Wekîl, Xana Zazê, Şibliya Çaçan, Gulîzera Etar, Werda Şemo, Cemîla Çavuş jî di nav gelî û çiyayên welatê Kurdistanê de belav bû.

**Di parastina mûzîka kurdî de rola Radyoya Yêrîvanê**

Bi frekansên radyoyê deng û nameyên




mûzîkjenên kurd li seranserê Kurdistanê belav dibû. Hin stranbêjên kurd yekem car di vê radyoyê de dengê xwe belavkirin. Aslika Qadir ku bi strana xwe ya navdar "Welatê Me Kurdistan e" li tevayê Kurdastanê hat naskirin. Ji van mûzîsyenan yek jî solîstê Koma Wetan Kerem Gerdenzerî ye. Gerdenzerî derbarê radyoyê de hestên xwe waha da der: "Radyoya Yêrîwanê ji bo gelê Kurd gelek baş bû, xebatkarên radyoyê xebatên gelek mezin dikirin. Ez çawa dizanim emekê Xelîlê Çaçan Mûradov di Radyoya Yêrîvanê de geleke pir e. Di her malê de her tim dengê mûzîk û stranên kurdî dahat."
Li gor daxuyaniyên ku ji alî xebatkarê radyoyê ve hatine kirin, zêdetirî 1600 stranên kurdî niha di arşiva radyoyê de qeydkirîne û ev hemû jara yekem di radyoyê de hatine weşandin lê bele piştî vê li tu deran nehatine weşandin.

**Naveroka Radyoyê**


Bi zêdebûna dema weşanê re naveroka radyoyê jî li gor salên pêşî dewlemend bû. Bi belavbûna dengê radyoyê ji guhdarvana jî name ji navenda radyoyê re dihatin şandin. Ji bo van daxwazên guhdarvanan bernameyek teybet bi navê 'Fikra Guhdarên Me' hate çêkirin. Bi saya vê bernameyê hin kes digêjiyan malbatên xwe yên ku ji ber şer û kaçberiyê wenda kiribûn. Bê van bi navê Serhildanên Kurda, Rojnîşa Çandê, Zimanê Teyî Dê, Pênçşema Edebiyatê, Rasthatin û Bîranîn bernamayên dewlemend dihatin çêkirin û helbet mûzîk.

# Bi tabloyên xwe heqîqeta jinê dide îfadekirin

**Vîndar Roj/ Şehba**

**Wênesaza ciwan yê Efrînî Berfîn Ehmed bi riya tabloyên xwe 25'ê Mijdarê Roja Cîhanî ya Têkoşîna li dijî tundiya li ser jinê bi bîr anî. Berfîn diyar kir ku piraniya tabloyên ku xêz dike li ser hest û heqîqeta jinê ye.**

Roja cîhanî ya Têkoşîna li dijî tundiya li ser jinê 25'ê Mijdarê, bi çalakiyên cur be cur li Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji aliyê tevger, rêxistin, partî û jinên herêmê ve tê xemlandin. Tvgera Kevana Zêrîn li kampa Serdem bi pêşengehekê ev roj bi bîr anîn. Di pêşengehê de jinên ciwan yên ku wênexêziyê dikin bi wêneyên ku vegotina hest, êş, berxwedanê, têkoşîn û xemla jinê dikin beşdar bûn û rengê jinê hat derketin. Yek ji wan wênesazên ku beşdar bûye Berfîn Ehmede ku piraniya tabloyên wê girêdayî jinê ye.
Wênesaza ciwan a Efrînî Berfîn



Ehmed derbarê tabloyên ku xêz kiriye û girêdana van tabloyan bi roja têkoşîna li dijî tundiya li ser jinê, ji rojnameya me re axivî.
Berfîn di axaftina xwe de diyar kir ku roja cîhanî ya têkoşîna li dijî tundiya li ser jinê bi têkoşîna jinên azad digihêjin armanca xwe û wiha got: "Ev roj ji bo tavahî jinên cîhanê rojeke taybet û ya têkoşînê ye. Divê ev roj bigihîne misogeriya azadiyê û bidawî anîna hemû cureyên tundiyê yên li ser jinan tê pêkanîn. Bê guman da ku ev yek pêk were di xeta têkoşîn û berxwedaniyê de ked û xebateke berfireh jê re divê. Bi taybet em dixwazin bal bikşînin ser têkoşîna tevgera azadiyê di vê xetê de. Jinên tevgera azadiyê û lehengên qehremantiyê di doza azadiya jin de li seranserî cîhanî kedeke pîroz dan û di oxira vê doze de bedelên giran hatin dayîn. Ji ber vê yekê em vê yekê tekez dikin ku wê roja têkoşîna tundiya li dijî jinê wê bi têkoşîna jinên tevgera azadiyê bigihîne armanc û misogeriyê".

**Berfîn bi wênesaziyê heqîqeta jinê dide îfadekirin**



Berfîn anî ziman ku ew di wêneyên xwe de herî zêde hest û jiyana jinan dide teysandin û wiha domand: "Bi jiyankirin û serwextbûnê re mirov dikare bêhtir bigihêje êş û zehmetiyên dayîkên me û hemû jinên cîhanê. Ez dema gihîştim vê rastiyê û bi hezkirina min ji wênexêziyê re, min bêhtir hewil da ez vê yekê di wêneyên xwe de biteysînim. Îro bi dehan wêneyên min yên ku hest, hezkirin, êş, zehmetî, hêz, têkoşîn û jiyana jinan dide îfadekirina hatine xêzkirin. Ji ber vê yekê ez jî weke jineke ciwan bi firşe û hezkirina xwe dibim yek ji jinên ku li hermber tundiyê têdikoşin dikim".

**`Doza azadiya jinê bi her du zayendan ve girêdayî ye`**

Berfîn Ehmed di dawiya axaftina xwe de bang li tevahiya jinan û cîhanê kir ku li hemberî tundiyê têbikoşin û wiha got: "Li hemberî tundiyê têkoşînkirin û şerkirin erka tavahî civak û cîhanê ye. Di vê sedsalê de li hemberî diyardeyên tundiyê yên weke kuştin, revandin, destdirêjî, tecawîzkirin, zewaca biçûk û hemû cureyên tundiya piskeolijî û fîzîkî divê bi yek dengî têkoşîneke ji kokê de were birêvebirin. Ji ber doza azadiya jinê dozeke gelemperî û kure û bi her du zayenda ve girêdayî ye".

# Amedekariyên Rêveberiya Xweser ji bo kampan

Rêveberiya Xweser her sal beriya werzê zivistanê, ji bo kempan dest bi amadehiyên dike û hewil dide tevahî pirisgirêkên kampan çareser bike. Rêveberê Ofîsa Karûbarên Koçberan û penaberan Şêxmûs Ehmed li bakur û rojhilatê Sûriyê bang li sazî û rêxistinên navneteweyî kir ku destekê bidin kampên bakur û rojhilatê Sûriyê.

**Ayşa Silêman/Qamişlo**

Li ser asta bakur û rojhilatê Sûriyê, li herêmên Rêveberiya Xwser 17 kampên koçberan hene, ev kamp di nava xwe de piranî Sûriyan dihewîne; 5 kamp yê Şehba ne, 3 kamp li Cizîrê û yek li Reqayê ye, di van kampan de xelkê Serêkaniyê, Girêspî û Efrînê ne, kempên din jî welatiyên Sûrî dihewîne, lê kempa Hol û ya Roj nêzî 30 hezar Iraqî têde ne û 10 hezar kesên biyanî ne ku ji 57 welatên cûda ne.

Girêdayî hazirtiyên Rêveberiya Xweser yên ji bo kempên bakur û rojhilatên Sûriyayê, yên werzê zivistanê, Rêveberê Ofîsa karûbarên Koçberan û penaberan Şêxmûs Ehmed ji rojnameya me re axivî.

**Kar û xebatên Rêveberiya Xweser ji bo kempan**

Rêveberê Ofîsa karûbarên Koçberan û penaberan Şêxmûs Ehmed diyar kir ku ji bo demsala zivistanê Rêveberiya Xweser ji bo tevahî kampan di seferberiyê deye û bi taybet ji bo pêdiviyên Zivistanê û wiha got: "Yek ji amadekariyan ji bo kempan çêkirina riyên ku derbasî nava kampan dibin, konên ku nema jiyan têde dibê û pêwîstiya guhertinê ji wan re divin, her wiha ji bo kempan mazot tê belavkirin, di heman demê de Rêveberiya Xweser ji bo hewcedariya zarokan ji betanî û esfincan re wek pirogiram ji xwe re datînin, ji bo mijarên tenduristiyê jî hewildidin ku dermanan peydabikin ji ber ku bi hatina zivistanê re gelek nexweşî jî çêdibin. Ji bo zêdebûna hijmarên zarokan di kempan de û kêmbûna dibistanan Rêveberiya Xweser hewldide wan zarokan birêkûpêk bike, seferberî ji bo ku çawa pêşwaziya zivistanê bike, ji ber ku di herêmên me de zivistaneke sar û seqemeke dijwar derbas dibe, rêveberî divê seferberiyê de ye ku çawa karibe pêdiviyên rojane peyda bike, her herêmek cûdahiyeke wê heye, kampin hene alîkarî ji hêla Saziyên Navdewletî ve ji wan re tên, piraniya kampên Rêveberiya Xweser, tenê hinek saziyên xwecihî destekê didin wan."

**Zehmetiyên ku tên dîtin**

Rêveberê Ofîsa karûbarên Koçberan û penaberan Şêxmûs Ehmed axaftina xwe bi dawî kir û wiha got: " Piştî şerê Okraniya gelek rêxistinên tendiristiya cihanî û netewên yekbûyî alîkariya xwe ji bûna herêmên me kêmkirin, ji 17 kampên ku Rêveberiya Xweser wan birêve dibe tenê 5 kamp ji hêla netewên yekbûyî tê naskirin, herwiha alîkariya ku tê jî bi riya Şamê re tê, pêdiviyên ku derbas dibin jî gelekî kêmin, ev yek bi xwe re gelek pirsgirêk û zehmetiyan tîne, ji ber ku pêdiviya koçberan bi destekdayîna netewên yekbûyî heye ji ber ku ev yek erkê waye, mixabin di mijarên mirovahiyê de jî dikevin bazarên siyasî de, zehmetiya herî mezin ku em dikşînin ambargoya ku li ser herêmên me tê ferizkirin, dergehê Til Koçer yê ku nehatî vekirin heta niha, alîkariya mirovî heger di riya şamê re were ev jî dikeve dinav zehmetiyên ku em dikşînin de, herwiha ne naskirina kempên me ji hêla netewên yekbûyî ve, astengiyan çîdike. Banga me ji Saziyên Navdewlêtî re ku çawa destekê didin tevahî herêmên din, bidin herêma me jî, herwiha hêviya me ew e ku dergehê Til Koçer were ve kirin û Netewên Yekbûyî derbasî van kampên me bibin û nasbikin, û civaka navdewletî destekê bide Rêveberiya Xweser ku çawa karibe ji bo van kampan pirisgirêkan çareser bike, herwiha Rêveberiya Xweser wek nameyekê ji bo raya giştî şandibû têde dabû xuyanîkirin ku dikare herêmên xwe bike pêşwaziya Sûriyên ku li libnanê dibin zextê de ne û destekê bide wan."





## Mislman û tundiya li dijî jinê



Hafiz Ahmet Turhalli

25'ê Mijdarê weke roja tekoşîna li dijî tundiya li ser jinê, hatiye pênasekirin.
Ev roja han di sala 1999'an de hatiye pejirandin. Di malbata mirovahiyêde ev pirsgirêk, weke birînekî ku nehatiye dermankirin û her roj xwe nû dike berdewam e. Di dîroka mirovahiyêde ev pirsgirêk bûye weke nexweşiya pênceşêrê û civakê roj bi roj dikuje. Ji bo vê pirsgirêkê diroka mirovahiyê, bi navê ol, felsefe û bîrdoziyên cuda, kar hatibe kirin jî, lê çareseriyek mayinde, heta roja îro jê re nehatiye dîtin.
Gelo ev tundiya dijî jinê, li cîhana Îslamî û di nava me misilmanan de çawa ye û di çi astêdeye?
Em karin bi hêsanî bêjin, di nava civaka me misilmanan de, pirsgirêk weke pirsgirêkeke cidî û bingehîn nayê dîtin. Di bilêvkirin û gotaran de, weke Îslamiyet hemû mafan dide û daye, an jî jin wek pîrozahî tên bilêvkirin.
Berovajî vê gotarê, di jiyana civaka me misilmanan de, radeya tundiya dijî jinê, zilma dijî jinê, ji ya gellek civakên dîtir zêdetire. Di serdema îro de, ew roj hatiye, divê em li xwe mikur werin û vê rastiya tundiya dijî jinê bibînin. Bi vî awayî em karibin pirsgirêka zilma dijî jinê jinava civakê rabikin. Di sedsala me ya îroyî de em zilamên misilmanan hêjî zilmekî mezin li jinan dikin û xwe binavê Îslamê jî vedişêrin.
Di malbatê de, di, zanyariyê de, di sîyasetê de, di qada aborî de jin û zilam li cem me, wek hev nayin dîtin û civak tundiyê dijî jinê jî, weke mafekî xwe yê olî, xwezayi û çandî dibîne.
Raya giştî ya derveyî cîhana Îslamî, me misilmanan wek civakekî zordest û zalim, li ser jinê pênase dike.
Lewre nuçeyên ku derdikevin, didin xuyakirin ku, kiryarên me yên dijî jinan, zulmekî gellekî girane. Ji Afganîstanê bigre heta nijeryayê, dewlet, cemaet, cemiyet, partî û terîqetên bi navê Îslamê tevgerbune, tundiya dijî jinê, an ji nedîtine tên, anjî wek mafekî zilaman yê rewa dibînin.
Di pêkanîna zilmê de, gelo Îslam vê nebaşî û xirabiyê baş dibîne?
Em seranser dibêjin ev tişt, îftîraye li ola Îslamê. Pîvanên ola Îslamê Qur'an û sunnet be, zelalkirina mijaran jî, asantir dibe.
‚Ey gelî mirovan me we ji mê û nêrekî (jin û zilam) afirand, (Hucurat 13)
‚Qenctirên we, ew kese kû ji hefser û malbata xwe re başe be'. (Tirmizî)
Pîvanên Qur'anê di pirsgirêka tundiyê zelale. Her curê tundiyê red dike. Ji serî heta dawiya Qur'anê rexneyên giran li dij kesên tund û tujiyê dikin tê kirin. Zulm wek karekî dij Xweda tê pênase kirin û tê lenet kirin.
Pêxemberê me di jiyana xwe de, dijî tund û tujiya jinê sekiniye û çanda dema cahiliyetê, ya dijî jinê rawestiyaye. Jinên ku tundî tujî li wan dihatin kirin giliyên xwe li ba Pêxember s.x. dikir û ew jî jiwanre dibû çareserî. Digot: ‚Hun cardin dixwazin vegerin ser hişmendiya serdema cahiliyê'.
Lê mixabin piştî koça pêxemberê me, bi jinê re danûstandin car din vegeriya serdema cahiliyetê. Ser navê Pêxember di derbarê Jinan de gellekî hedîsên derew hatin gotin, bi gotinekî dîtir îftîra û derew li Pêxember hatin kirin. Tund û tujiya dijî jinê gunehekî mezine, têkbirina edaletê û xirakirina civakê ye.

# Roja cîhanî ya zarokan

**Berçem Silêman/Qamişlo**

Roja cîhanî ya zarokan, rojek hatiye diyar kirin ku her sal ji bo hişyarî û bîranîna mafên zarokan tê pêşwazîkirin. Di sala 1925'an de cara yekem li Cinêvê di konfaransa cîhanî ya çavdêriya zarokan de, roja cîhanî ya zarokan hate diyarkirin. Di 1'ê Hezêrana sala 1950'yan de li gelek welatên sosyalîst ev roj hat pîrozkirin, armanca wê ji bo parastina mafên zarokan bû.
Komeleya giştî ya Neteweyên Yekbûyî roja cîhanî ya zarokan di 20'ê Mijdara sala 1959'an de weke roja mafên zarokan pîroz kir. Ji ber ku piştî konferansa cîhanî ya Cinêvê tu roj nehatibûn diyarkirin, ji ber wê her welat li gorî pêwîstiyên çanda xwe roja zarokan pîroz dikir. Bi diyarkirina roja cîhanî ya zarokan re, welatên endamên neteweyên yekbûyî biryara parastina mafên zarokan dan. Herwiha bêyî cudahiya zayendî, reng, ol û reseniya neteweyî yan civakî, ji bo dabînkirina mafê soz, hezkirin, têgihîştin, xwarina pêwîst, çavdêriya bijîjkî û perwerdeya azad roja zarokan hate destnîşan kirin. Di sala 1959'an de, Civata Giştî ya Neteweyên Yekbûyî 20'ê Mijdarê weke Roja Cîhanî ya Zarokan pejirandin, da ku li seranserê cîhanê bextewariya zarokan pêşve bibe û ji bo parastina mafên zarokan hevkariya navneteweyî teşwîq bike û ev roj ji bo bîranînê hate ragihandin.
Roja Cîhanî ya Zarokan her sal tê lidarxistin û ji bo hemû zarokên ku di şerên cîhanê de jiyana xwe ji dest dane. Li dijî kuştin, jehrîkirin û parastina mafên zarokan, di 20'ê Mijdara 1949'an de Federasyona Jinên Demokratîk a Navneteweyî, civîneke meclisê li dar xist. Li Moskowê nûnerên Çîn û welatên din bi hêrs sûcên kuştin û jehrîkirina zarokan ji aliyê emperyalîst û reaksiyonên welatên cuda ve eşkere kirin. Di civînê de biryar hat dayîn ku her sal 1'ê Hezîranê bibe Roja Cîhanî ya Zarokan. Festîvalek e ku ji bo parastina mafên zarokan li ser jiyan, lênêrîna tenduristî, perwerdehî û girtina zarokan li hemû welatên cîhanê, ji bo çak kirina jiyana zarokan û li dijî destdirêjî û jehrîkirina zarokan hatiye sazkirin. Heya niha gelek welatên cîhanê cejna zarokan destnîşan kirine.
Hêjayî gotinê ye ku zarok siberoja welat û hêviya gelan e. Her tim armanca hemû welatên cîhanê ew e ku ji bo hemû zarokan jîngeheke baş a malbatî, civakî û hînbûnê ava bikin û bi tenduristî û bextewar mezin bibin. Di 1'ê Hezîrana 1950'î de, mamosteyên ciwan ên Çîna nû yekem Roja Navneteweyî ya Zarokan destnîşan kirin. Di sala 1931'an de, Civata çînê 4'ê Nîsanê Roja Zarokan destnîşan kirin. Ji sala 1949'an û vir ve 1'ê Hezîranê bi awayekî fermî weke Roja Zarokan hatiye destnîşankirin. Di vê rojê de, dibistan bi gelemperî çalakiyên kolektîf organîze dikin. Zarokên ku 6 salî jî dikarin wê rojê sond bixwin ku tevlî Pêşengên Ciwan ên Çînî bibin û bibin Pêşengên Ciwan ên birûmet.





# 33 roj in rojnamevan Silêman Ehmed winda ye

Ji Rojnamevan û edîtorê beşa Erebî yê ajansa me Rojnews'ê Silêman Ehmed ku ji aliyê PDK'ê ve hatiye revandin, 33 rojin agahî nayê girtin. Her ku diçe guman û fikarên li ser jiyana Silêman Ehmed zêde dibin, PDK rê nade ne parêzer ne jî malbat kesek hevdîtinê li gel bike. PDK ji ewlehî û jiyana edîtorê ajansa Rojnews'ê Silêman Ehmed berpirse.

**Navenda nûçeyan**

Edîtorê beşa Erebî ya ajansa me Silêman Ehmed roja 1'ê Cotmehê ji bo serdanê çûbû cem malbata xwe ya li Taxa Şêx Meqsud a Helebê. Silêman roja 25'ê Cotmehê dema xwest di ser deriyê Pêş Xabûr (Sêmalka) re derbasî Başûr bibe, ji aliyê hêzên PDK'ê ve hat revandin û ev 33 rojin agahî jê nayê girtin. Hefteyek piştî windabûna Silêman Ehmed, asayîşa PDK'ê ya Dihokê bi daxuyaniyek tejî berovajîkirin û nerast gotin ku qaşo revandina rojnamevan Silêman Ehmed 'ne ji ber karên wî yên rojnamevaniye' û bi eşkere gefa cezakirinê li rojnamevan Silêman kirin û îtiraf kirin ku wî revandine. Silêman Ehmed nêzî 5 salin di beşa Erebî ya Rojnewsê de wek edîtor dixebite. Ji ber vê yekê tometbariyên nerast yên Asayîşa Duhokê ya PDK'ê bi tundî ji milê navenda ajansa Rojnewsê û hemû rojnemevanan ve hate red kirin û şermezar kirin. Û hate daxwazkirin ku aqûbeta Silêman Ehmed di zûtirîn dem de were eşkerekirin û berdan.
Li gel ku bertek û helwestên dijî revandina Silêman Ehmed zêde dibin, her ku diçe guman û fikarên li ser jiyana Silêman Ehmed jî zêde dibin. Lê hîna ji bilî daxuyaniyek tejî derew a PDK'ê, tiştek din ji aliyê hikûmeta Herêmê ve derbarê rewşa Rojnamevan Silêman Ehmed de nehatiye ragihandin.
Yek ji parêzerên Silêman Ehmed Nerîman Ehmed, di daxuyaniyek ji bo Rojnews de got: "Ji dema revandina Silêman Ehmed ve, me hewl da ku em wî bibînin û dosyeya wî bixwînin, me serdana Asayîşa Giştî ya Duhokê kir. Di destpêkê de bi hinceta ku ne li wê derê ye, em asteng kirin. Tevî ku me piştrast kir ew li wê derê ye û agahiyên li ser cihê wî di nav Asayîşa Duhokê de hene, lê piştre wan gotin ku ew li jêr lêkolînê de ye û nayê dîtin."
Herwiha parêzer Nerîman got; "Piştî ku em hatin astengkirin, me serdana dadwerê asayîşa Duhokê kir da ku daxwaza dîtina Silêman Ehmed bikin û hemû rêkarên yasayî cîbicî bikin û bikin bi wekalet. Dadwerê asayîşê razî bû û biryar da ku em wî bibînin û piştî ku biryar gihandin Asayîşa Giştî, rê nedan ku em wî careke din bibînin."
Girêdayî vê yekê de jî çavdêrê Siyasî Elî Kerîmî got Divê demil dest Silêman Ehmed were berdan Çavdêrê Siyasî Elî Kerîmî di derbarê revandin û windakirina Rojnamevan Silêman Ehmed de kurte vidiyoyek diyar kir ku divê rojnamevan û rexengirên Herêma Kurdistanê azad bin û qada rojnamevaniyê jî berfireh bibe.
Çavdêrê siyasî Elî Kerîmî di derbarê revandin û windakirina Rojnamevan Silêman Ehmed ji aliyê PDK'ê ve peyamek belav kir.
Elî Kerîmî destnîşan kir ku divê rojnamevan û rexengirên Herêma Kurdistanê azad bin û qada rojnamevaniyê jî berfireh bibe.
Çavdêrê Siyasî Elî Kerîmî di dewama kurte vidiyoya ku belav kirî de wiha got: "Hêvîdarim êdî welatiyên Herêma Kurdistanê zilm û zordariya Malbata Barzanî qebûl neke." Elî Kerîmî her wiha destnîşan kir ku Malbata Barzanî bi berdewam zext û êşkenceyê li rojnamevan û rexnegiran dike, mînaka vê jî eve ku 33 roj in rojnamevan Silêman Ehmed revandine û heta niha çarenûsa wî nediyare.



# Li Xezayê agirbesta demkî di roja 3'emîn de berdewam dike

**Agirbesta demkî ya 4 rojan a navbera Îsraîl û Hamasê pêk hat, di roja xwe ya 3'emîn de berdewam dike. Lîsteyên navên rehîneyên ku dê bên berdan hat eşkerekirin, di rojekê de 200 kamyonên alîkariyê ketin Xezayê.**



Agirbesta demkî ya 4 rojan a di navbera Îsraîl û Hamasê de bi navbeynkariya Qeter û Misirê pêk hat, di roja 2'emîn de ye.
Ofîsa Serokwezîrê Îsraîlê, daxuyaniyeke nivîskî weşand û da zanîn ku piştî 13 rehîneyên duh di çarçoveya şert û mercên agirbestê de hatin berdan, ji aliyê Hamasê ve lîsteya rehîneyên ku tê payîn îro bên berdan radestî wan hatiye kirin.

**Agahî dan malbatên wan**

Li gorî agahiyên hatine girtin, ofîsa serokwezîrê Îsraîlê Benjamin Netanyahu diyar kir ku lîsteya navên koma duyemîn a rehîneyên Îsraîlê ku dihat plankirin îro ji Xezayê bên berdan, girtiye. Ofîsa Netanyahu di daxuyaniya nivîskî ya li ser hesabê medyaya dijîtal de, hat diyarkirin ku îstîxbarata derve ya Îsraîlê Mossad û artêşê lîsteya rehîneyên Îsraîlî ku îro bên berdan, girtine. Dema lîste ji aliyê hêzên ewlehiyê ve tên lêkolînkirin her wiha agahî dan malbatên kesên ku dê bên berdan.
Di çarçoveya lihevkirina di navbera Hamas û Îsraîlê de, di mijara derbasbûna alîkarî û sotemeniyê ji bo Zîvala Xezaya dorpêçkirî de jî lihevkirin pêk hatibû. Misirê ku di vê çarçoveyê de daxuyaniyek da, diyar kir di roja ewil a navbera mirovî ya duh danê sibê dest pê kir de 200 tirên bi malzemeyên alîkariyê hatine barkirin ketine Xezaya dorpêçkirî. Li gorî daxuyaniyê, serokê Saziyê Ziya Raşvan der barê kamyonên alîkariyê yên ji Xezayê re hatine şandin û birîndarên ku anîne welatê wan de, nirxandin kir. Ziya Raşvan, diyar kir ku roja ewil ji bilî 200 kamyonên alîkariyên mirovî, 2 ambûlansên Fona Bijî Misirê, 15 kamyonên aydê Nexweşxaneya Sahra ya Urdunê û 11 kamyonên aydê Nexweşxaneya Sahra BAE'yê derbasî Xezayê bûne.
Li aliyê din, di daxuyaniyê de hat diyarkirin ku 17 birîndarên ji Xezayê anîne Misirê û 12 ji wan bi refakatvanên xwe re ji bo dermankirinê şandine Tirkiye û Mîrnişînên Erebî yên Yekbûyî. Hat ragihandin ku 134 Filistîniyên ji ber êrîşên Îsraîlê yên ji 7'ê Cotmehê vir ve li Misrê asê mane jî bi awayî dilxwaz vegeriyane Zîvala Xezayê.

**Alîkarî gihîşt Bakur**

Îsraîl ji destpêka roja êrîşê ve ji kesên ku li bakurê Xezayê dijîn dixwaze derbasî mile başûr bibin. Li bakur taybet nedihişt sewqiyeta sotemeniyê be kirin. Di çarçoveya agirbesta demkî ya 4 rojan li Xezayê destpêkir, piştî 49 rojan cara yekem 3 kamyonên alîkariya mirovî derbasî Zivala Xezayê bû. 3 kamyonên alîkariyê ku ji deriye sinorê Refahê derbas bû duh şev gihîşt bakurê Xezayê

**Rehine ji jin û zarokan pêk tên**

Peymana derbarê agirbesta demkî ya 4 rojî ya di pevçûnên di navbera Îsraîl û Hamasê 24'ê Mijdarê de ket meriyetê. 24'ê Mijdarê roja înê di saetên şev de Hamas 13 rehîneyên Îsraîlî, Îsraîl jî 24 jin û 15 zarok 39 filistînî ji zindana Ofer a Îsraîlê ya li Şerîaya Rojava ya dagirkirî serbest berda. Hamas di çerçoveya peymanê de 10 Tayland û 1 welatiyên Fîlîpînê serbest berda bû. Tayland diyar kir ku di destê Hamasê de hîn 20 welatî hene.
Di çerçoveya lihevhatinê de di destê Hamasê beranberî 50 Îsraîlî di girtigeha Îsraîlê de 150 Filistînî dê bê berdan. Rehîneyên ku werin berdan ji her du aliyan jî ji zarok û jinan pêk tê. **JÎNHA**

# Li Tirkiye û Kurdistanê di 10 mehan de 264 jin û 21 zarok hatin qetilkirin

**Li Tirkiye û Kurdistanê di 10 mehan de 264 jin û 21 zarok ji aliyê mêran ve hatin qetilkirin. Edîtora JINNEWS'ê Gulşen Koçuk jî li ser mijarê got: "Çawa ku ne tenê rojekê, her kêliyê her roj tundî heye, li dijî wê tundiyê têkoşînek mezin heye."**



Hemû şêwazên tundiyê, çi di nava mal û malbatê de û çi jî di nava gel de, binpêkirina mafên mirovan in ku şopên kûr li ser jinan dihêlin. Ji ber newekheviya jin û mêr li hemû cîhanê tundiya mêr-dewleta li ser jinan didome.
Jin li parêzgehên Tirkiye û Kurdistanê rastî tundiya sîstematîk tên, kevneşopiyên ku tundiyê xurt dikin tên destekkirin, tedbîrên parastinê û pêşîlêgirtinê nayên sepandin, darizandinên adil nayên kirin û sûcdar cezayê ku heq dikin nagirin. Jin carna ji aliyê zilamên ku nas nakin ve û carna jî ji hêla zilamên herî nêzî wan ve rastî tundiyê tên.
Hewldana jiyana jinan xala herî dawî ya tundiyê ye. Jin bi hincetên curbecur ji aliyê mêran ve tên qetilkirin, weke ku dixwazin dev ji hev berdin, nezewicin an jî di nav têkiliyê de ne, dixwazin li ser jiyana xwe biryarê bidin, kincên ku dixwazin li xwe bikin, an jî dixwazin li zanîngehê bixwînin. Kiryarên ku mafê jiyanê ji jinan distînin zilamên herî nêzî wan in. Bi gotineke din, sûcdar zilamê ku jin pê re zewicî ye, kurê wê, birayê wê, hevalê wê yê ku bi hev re dijîn, cîranê wê yê mêr, zilamê ku pê re li ber hevberdanê ye, hevalê wê yê berê yan bavê wê ye.

**Mirinên bi guman baş nayên lêkolînkirin**

Gelek bûyerên mirina bi guman ên jinan wekî "mirina xwezayî, qeza, xwekuştin" tên tomarkirin bêyî ku werin lêkolînkirin ka ew rastî qeza, kuştin an jî întihar e. Hatibû îdiakirin ku Şule Çet li Enqerê ji qata 20'an a plazayek xwe avêtiye û jiyana xwe ji dest daye. Bi têkoşîna jinan û malbata wê derket holê ku ew hatiye qetilkirin. Ev yek ji bo mirinên bi guman bû mînak.

**Tu îstatîstîkek ku asta tundiyê eşkere bike nayê girtin**

Îstatîstîkên fermî yên tundiya li ser jinan eşkere dikin, nayên girtin. Berevajî vê, ji aliyê rojnameger û rêxistinên jinan ve ji bûyerên tundiyê yên ku herî zêde di çapemeniyê de cih digrin, dane tên berhevkirin. Yek ji kanalên ku daneyên tundiyê amade dike JINNEWS e. Li gorî daneyên ku JINNEWS'ê berhev kirine, di navbera Çile-Cotmeha 2023'an de tenê di 10 mehan de 264 jin û 21 zarok ji aliyê mêran ve hatine qetilkirin. 164 jin û 24 zarok bi guman mirine.

# ‘Damezrandina PKK’ê ji bo gelê kurd vejîn bû’

Endamê Meclisa Dadweriyê ya herêma Cizîrê Nûredîn Şakir da zanîn ku berî damezrandina PKK’ê, gelê kurd di qonaxeke tarî de dijya û bi avabûna PKK’ê re bi fikr û felsefeya Rêber Apo gelê kurd ji nû ve vejiya, jina kurd bû xwedî nasname û hêz, herwiha civaka kurd jî hat rêxistinkirin.

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

Ev bû 45 sal ku Partiya Karkerên Kurdistanê weke partiyeke ku milkê gelê kurd û hemû gelê azadîxwaz e hatiye damezirandin, PKK’ê 45 salên xwe li ser bingeha fikrên azad û demokrat heta roja îro bi lehengî dijî serdestiyê têkoşînê didomîne, herwiha bû yek ji tevgerên herî bi bandor li ser asta cîhanê.



Girêdayî damezirandina Partiya Karkerên Kurdisatnê (PKK) Endamê Meclisa dadweriyê(Edaletê) ya herêma Cizîrê Nûredîn Şakir bersiva pirsên me da û hevpeyvîn jî wiha bû:

**Hûn rewşa gelê kurd ya berî damezrandina PKK’ê û piştî damezrandina wê çawa dinirxînin?**

Em tev dizanin ku berî PKK’ê were damazrandin ku gelê kurd di çi rewşê de bû, birastî gelê kurd di rewşeke wisa de bû ku gelekî din nedikarîbû bibêje xweziya rewşa me bi rewşa vî gelî be û biheside gelê kurd. Wê demê gelê kurd ber bi qirkirinê ve diçû, ketibû bin bandora hişmendiya eşîret, ol, malbat û faodalîzimê de. Li aliyekî din jî dijminan bi riya şerê taybet, hişmendiyek û çandeke dûrî çand û ramanên resen a kurdewariyê ava kiribûn. Ji ber vê asîmîlasiyonê jî gelê kurd di nav gelên cîhanê de hatibû perçiqandin û di heman demê de jî kurdan bi çavekî biçûk li xwe meyze dikirin. Ya herî ku zilm û zordarî li ser hatibû kirin jî jina kurd bû, malbat, civak, serdestan jin çewisandibûn û bêmaf hiştibûn. Herwiha li gelê kurd wisa hatibû ku qedera xwe di destê dijmina de didît. Kurdan bawer nedikir ku wê rojek were û azadiyê bi dest bixînin û ji destê dagirdkeran rizgar bibin. Ev yek bi awayekî neyînî bandor li kurdan kir, herwiha hişt di warê xwedîderketin û parstina li dîrok, çand, zimanê xwe û hwd… de lawaz û bêmaf bimînin. Lê damezirandina PKK’ê ji bo gelê kurd rojeke nû û destpêka serdemeke tijî hêvî, zanist û azadî bû. Herwiha bi saya şoreşê û PKK’ê re gelê kurd li her çar parçeyên Kurdistanê xwe di hemû waran de bi rêxistin kir.

**Bi avabûna PKK’ê re çi guhertin û veguhertin li ser asta Kurdstanê pêk hat?**

PKK’ê bi xwe ne ji wan partiyên ku bi fikr û rêxistina xwe bi terzê kilasîk û kevnar yên mîna partî û tevgerên kurdan e. Em nikarin hevrûkirinekê di navbera Partiya Karkerên Kurdistanê û partiyên din de çêbikin, ji ber ku PKK’ê li ser fikr û rêbazîkî nû hat afrandin. Di heman demê de tiştê ku PKK’ê ji bo gelê kurd kir van partiyên berê yên kurdan nikarîbûn pêk bînînin, lewma gelek ji van patiyan jî li dijî vê fikr û felsefeya nû kar dikin. Bi derketina PKK’ê re sûdeke mezin li gelê kurd hat kirin ku destpêka qonaxeke nû ji bo gelê kurd hat afandin û vê partiyê dîroka kurdan , ziman, nasname û çanda kurdî bi cîhanê jî da naskirin. Ev qonaxa nû ya li ser fikr û felsefeya Netewa Demokratîk nefes da civakê, di serî de jin ji hişmendiya malbat, dewlet û kevneperstiyê a serdest hat rizgarkirin. Bi vî awayî jina kurd li nik zilamê kurd xwe bi rêxistin kir û sîtstema hevseroktiyê hat çêkirin. Gelê şoreşgerî li her çar parçeyên Kurdistanê bi pêşengtiya jinê biryara destpêkirina têkoşeriyeke bê hempa di vê qonaxa nû de da. Jina kurd li Kurdistanê dest bi berxwedaniyekê kir ku xwe di hemû waran de, weke milê siyasî, aborî, civakî û hwd… li pêş xist, nexasim di aliyê leşkerî de. Berxwedaniya jinan ya ku di şerê li dijî DAIŞ’ê de yê li Rojava û Şengalê da meşandin, berxwedaniyeke efsûnî bû û hişt ku cîhan bejna xwe li hemberî vê berxwedanî, vîn û cegeriya jinên kurd bitewîne.



**Patiya Karkerên Kurdistanê çawa karîbû bandorê li gelên Rojhilata Navîn û cîhanê bike?**

PKK’ê xwedî pirojeyeke mafdar e ji bo gelê kurd, pirojeya vê partiyê jî bidestxistina mafê azadiya 50 meliyon kurd e û gelê kurd jî riya xelasiya xwe û çareseriyê ji kul û birînên xwe di PKK’ê de jî dibîne. Ji bo vê yekê jî PKK’ê dengvedana xwe û gelê xwe çarçoveya Kurdistanî derbas kir û bi fikrên xwe bandor li tevaya gelên cîhanê kir. Fikr û ramanên Rêber Apo û PKK’ê ji bo hemû pirskirêkên ku li cîhanê rû didin cihê çareseriyê ye. Îro şerekî dijwar di navbera Israyîl û Hemasê de li dar e, gelek siyasetmedarên biyanî yên ku fikr û felsefeya Rêber Apo xwendine, çareseriya vî şerî jiyankirina gelê cihû û ereb bi hev re riya çareseriya vê pirsgirêkê ye. Encex felsefeya Netewa Demokratîk bibe çare ji bo gelê Filestînê. Fikr û felsefeya Rêber Apo ne tenê ji bo çareseriya dozo gelê kurd e, lê dermanê pirsgirêkên hemû gelên ku li welatên xwe bi destê dewletên netewperest hatine çewsandin. Ji ber vê yekê jî em dikarin bibêjin ku PKK’ê partiyeke xwedî fikr û felsefeyeke pêşeketiye û bi dengvedana ramanên azad, xwe li ser asta cîhanê isbat kir. Li ser vê bingehê jî gelê kurd biryar da ku ew dev ji riya berxwedanê bernadin û em dibînin ku ev zêdeyî 40 salan e, ji bo doza xwe têkoşînê dike. Herwiha ev bi 10’ê salan e ku ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo li ser asta cîhanê diqîre û bang dike. Di dawiyê de 45’emîn salvegera damezrandina PKK’ê li gelê kurd, şehîdan û malbatên wan, Rêber Apo, gerîlayên azad, kesên di zindananê dagirkerên Kurdistanê de û gelên cîhanê yên azadîxwaz, pîroz dikin û dibêjin tekez wê serkeftin para gelê kurd be.

# Kurd, şer û dîaspora

**Ilyas Batû**

Ji hezaran salan vir ve ye ku ji ber gelek sedemên xwezayî û sedemên ku mirov bi xwe çavkaniya wan in, koçberiya mirovan berdewam e. Her çi qasî di koçberiya serdema moderin de sedemên xwezayî hîn xuya bikin jî, para pirtir a van sedemên xwezayî dîsa li wan sedemên din vedigerin, ku mirov bi xwe çavkaniya wan in. Mirov, ji bo berjewendiyên xwe pêwendiyeke xelet û talanker bi xweza û erdê re datînin û di encamê de devera ku lê dijîn, dibe devereke weha ku ew êdî nikarin lê bijîn. Ji lew re, bêgav dimînin ku koç bikin.

Bêguman e ku ji sedemên herî pêşîn ê koçberiya mirovan, nemaze jî ya koçberiya girseyî, yek jê jî şer e. Şerê ku di serdema moderin de jî dibe, ji berevajî wî şerî ku mirovan bi xwezayê re dikir da ku li jiyanê bimana; şerekî birêkûpêk e, biplankirî ye û bi gelek amrazan tê kirin ku îro roj ji bilî hegemonyaya çandî û aborî, gihîştiye asta şerê sîberî (cyber).

Pêşketinên ku di şer de çêbûne, şêweyê koçberiyê jî guherandine. Reng e ku pêkhateyek ji ber şer an jî karesatên ku bi serê wan de hatiye, koçber û sirgûnî welatekî din bibe. Lê, raborî û siberoja wan a hevpar dike ku endamên wê pêkhateyê li wî welatî nû bêhtir li hev bibanin û ji bo xwedîlêderketin û bipêşketina welatê xwe bixebitin ku êdî lê najîn. Her weha welatek dema ku pêvajoya xwe ya modernîzasyonê dijî, hinek kesên bijarte ji nav xwe bi rê dike welatekî bipêşketîtir da ku sûd û mifayê ji derfet û azmûnên wî welatî wergire ku jê bipêşketîtir e û berî wî ev pêvajo li dû xwe hiştiye. Para pirtir a van kesên bijarte ciwan in, ji ber ku dînamîzm û enerjiya wan xurttir e. Têgiha dîasporayê bi giştî wan kesan dinimîne ku ji ber sedem û armancên jorbihûrî ku li welatekî din in. Lê, îro roj ji bo ku mirov vê têgihê ji bo komeke weha bi kar bîne, divê li dor raborî û siberoja hevpar yekîtiya wan çêbûbe. Divê ev jî bê diyarkirin: Çaxê ku welatek ciwanên xwe bi rê dike ji bo welatekî ji xwe bipêşketîtir, gelek caran ev ji bo demeke diyarkirî ye û ji wan ciwanan tê xwestin ku piştî demekê ew li welatê xwe vegerin û tiştên ku hîn bûne bi civaka xwe re par ve bikin.

Koçberiya me kurdan a neteweyî jî ji demeke dirêj ve li dar e. Çêdibe ku mirov dîroka wê vegerîne dema desthilatdariya siltanê osmanî Mehmdûdê 2yem (1808-1839), ku serweriya mîrektiyên kurdan kêm kir û malbatên wan jî sirgûnî Stembolê kirin. Ji wê demê û heta niha tişta giring ku divê em bizanin, ew e ku sedema sereke ya koçberiya kurdan “şer” e ku li cografyaya Kurdistanê û bi giştî li Rojhilata Nêzîk li dar e. Ji loma ye ku dema ku em behsa dîroka xwe dikin, em dibêjin “kurd sirgûn bûn”. Hima bêje derfetên kurdan rê nedane ku ew ciwanên xwe li ser navê “bipêşketinê” bi rê bikin welatin din. An jî çaxê ku weke mînak li Başûrê Kurdistanê derfetan rê daye jî, kêm hatiye kirin an jî qet nehatiye kirin.

Di vê behsê de mirov ji bo dîasporayên herî xurt dikare ya cihû û ermenan weke mînak bide. Weke mînak; çaxê ku 2017an ji aliyê hikûmeta Donald Trump hate ragihandin ku êdî paytextê Israîlê bajarê Qudsê ye, diasporaya cihûyan a li Amerîkayê kir ku biryareke weha bê dayin. Ermen û rûs jî ji sedsala 19em ve hevalbendên hev bûn, lê bi hewildana dîasporaya ermenan a li DYAyê, îro roj Ermenistanê xwe bêhtir nêzîkî DYAyê kiriye û biryarek derxistiye ku dema Vladîmîr Pûtîn pê biavêje erda Ermenistanê, dikare wî destgîr bike. Libnana ku piştî şewata bendera li bendera Bêrûdê ya 2020’î qeyrana aboriyî lê kûr bûye, bi dahata libnaniyên li derveyî Libnanê dikare li ser piyan bimîne.

Li gorî daneyên statîstîkan bi qasî 2 milyon kurd bi tenê li Almanyayê dijîn. Lê ji ber ku civatên ku ava kirine ji berjewendiyên neteweyî bêhtir li sînorên partîzaniyê asê bûne, nikarîn herka çek û cebilxaneyê rawestînin ku di bendera Hambûrgê re ji dewleta tirk re tên şandin. Mobîlîzasyon û hêza aboriyî ya 2 milyon kesan ji bilî proteseyoke li ber bendera Hambûrgê, dikare pereyekî zêdetir ji yên tirkan li hev bicivîne ku tirk didin dewleta Almanyayê û bi vî awayî dikarin jî pêşî li qirkirina gelê xwe bigirin. Ji bilî vê, cihê mixabiniyê ye heger diasporaya kurdan heta vê kêliyê jî nikare bi hêzên navneteweyî qada hewayî ya Rojavayê Kurdistanê bide qedexekirin ji balafirên dewleta tirk re.

Belkî li Kurdistanê timî rîsk hebe ku kurd bên qetilkirin û zindanîkirin. Lê, li ser kurdên li Ewropa, DYA, Kenada û hwd. ferz e û derfetên wan hene ku xwe hînî şerê sîberî bikin. Ne xeyal e, divê xwe hîn bikin bê ka mirov çawa dikare bi riya kompîtera xwe programên balafirên tirkan pûç û hack bike berî ku bigihîjin û bên Kurdistanê bombaran bikin. Xebatên zanistî û weşandina rojname û kovarên derbarê teknîkên şer de jî ji bo me gelekî giring in û divîbû heta niha em di vî warî de zêdetir xwedî agahî bûna. Çi ku em çendî aşitîxwaz bin jî şer heye û li me tê ferzkirin.



# ‘27’ê Mjidarê roja vejîna gelê kurd û tevahiya gelên azadîxwaz e’

Endamên sazî, partî û tevgerên bakur û rojhilatê Sûriyê 45’mîn salvegera damezrandina a Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) pîrozkirin û wiha gotin: “27 Mijdarê roja vejîna azadiyê ye. PKK’ê bi dilsoziyeke mezin û birayardariyeke dîrokî, derkete pêş û ji bo azadiya gelê Kurd û tevahiya gelên bindest têkoşîneke bê hempa dide meşandin.”

**Birûc Resûl/ Qamişlo**

Di 27ê Mijdara 1978`an de, li gundekî biçûk yê bajarokê Licê, Fîsê, bi his û ramanekî hemdemî û nêrîneke ku binyata xwe ji 10 hezar salên dîroka kevnar distand, Partiya Karkerên Kurdistanê PKKê hate damezrandin. PKK’ê gav bi gav û roj bi roj ber bi guhertina çarenûsa gelê kurd ve meşiya. Ji bo parastina nasname, dîrok, erdnîgarî, îrade, hebûna û siberojeke bi rûmet ji gelê kurd re gelek bedêlên giranbuha dan. Di qonaxa îroyîn de jî, PKK’ê ji bo azadiya gelan gelek serkeftinên dîrokî bi dest xist.

Derbarê salvegera damezrandina Patiya Karkerên Kurdistanê (PKK)`ê endamê Partiya Yekîtiya Demokiratîk (PYD) Silêman Hesen, endamê rêveberiya Meclisa Malbatê Şehîdan a bajarê Qamişlo û endamê Tevgera Ciwanên Şoreşger yê bajarê Qamişlo Hemo Bedir ji rojnemeya me re axivîn.

Silêman Hesen diyar kir ku berî damezrandina PKK`ê gelê kurdber bi hilandinê ve diçû û wiha got: “Dewleta Tirk ku li ser mîrasa Impratoriya Osmanî hatiye avakirin, herdem di nava hewildanên qirkirina gelê kurd e bû, herwiha hêzên desthilatdar li Rojhilata Navîn bi giştî jî dixwestin gelan bê çrade bihêlin û wan wekî kole bikar bînin û heta îro jî ev hewildan berdewam e. gelê kurd di hundirê xaka Mozobotamiya de. Li hemberî siyaseta qirkirina gelan, Rêber Apo û hin hevalên xwe di destpêkê komeke Îdolojî ava kirin û nêzî 7 salan xebat, lêkolîn û kar dewamkirin, piştî wê biriyar dan ku ji bo parastina gelê kurd û tevahiya gelên bidest partiyekî rêxistinî ava bikin. Di wê çarçoveyê de, di 27’ê Mijdara sala 1978’an de Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) hat bi fermî hat ragehandin.”

**‘PKK’ê partiya mirovahiyê ye’**

Silêman Axaftina xwe wiha berdewan kir û got: “ PKK`ê ji destpêka xwe û heta niha, bi Taybetmendiyên xwe, xwe di nava dilê û mejiyê gelê kurd de çand. Her wiha ji bo ku pêşengitiyekî rast bide meşandin, hebûna wê di nava gel de pêwîst bû. Ji ber vê yekê PKK`ê tirsekê pir mezin di dilên dweletên desthiledar û dewleta Tirk a dagirker de da avakirin. Ne dihat qebûlkirin ku Rêberê gelê kurd û mafên wan hebe.Bi damezrandina PKK`ê re hêza dagirker û desthilatdaran lawaz bû. Dewleta Tirk a dagirker gelek caran hewil da ku gelê kurd qir bik, lê ji ber berxwedana PKK’ê armancên dewleta Tirk pêk nehat. PKK’ê bi çend kesan dest pê kir û niha bi hezran şervanên wê hene û bi milyonan mirov dilsozê wê ne. PKK’ê partiya mirovahiyê ye.”

**‘PKK`ê hebûna gelan e’**

Endamê PYD’ê Silêman Hesena-xaftina xwe wiha qedand: “Banga min ji bo gelê kurd û tevahiya gelên azadîxwaz, ew e ku bi her cureyê ku tê xwestin, ji bo azadiya Rêber Apo a Fîzîkî berxwedaniyê û çalakiyên xwe bidomînin. Xala herî girîng ew e ku em fikir û felsefeya Rêber Apo di hişmendiya xwe de hîn zêdetir biçinin, her wiha yê ku PKK`ê da avakirin Rêber Apo ye û PKK`ê jî hebûna tevahî gelan e.”



**Silêman Hesin**



**Mehsûm Hesin**



**Hemo Bedir**

**‘Roja 27’ê Mijdarê roja vejîna gelê Kurd e’**

Di heman çarçoveyê de Mehsûm Hesen da xuyakirin ku roja damizrandina Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) roja vejîne gelê kurde û wiha got: “Gelê Kurdistanê di dîroka mirovahiyê de xwedî nirxên bi wate ye. Lê belê, ji aliyê hêzên mêtinger ve ev dîroka gelê Kurd hate dagirkirin. Her wiha tişta herî bi êş û nayê qebûlkirin jî, çarenûsa li ser gelê Kurd ferzkirî bû, vê ferzkirinê demeke pir dirêj dewam kir û tevahî nirxên Kurdan ên neteweyî hatin perçiqandin. Li hemberî qirkirina kurdan Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK)’ê di 27’ê Mijdara 1978’an de hat damezrandina. Di wan rojan de jî, li Tirkiyê têkoşîna şoreşgerî her ku diçû berfireh û mezin dibû. Rêber Apo rastiya gelê Kurd a civaka xwezayî di kesayeta xwe de zindî kir û tovên zindîbûnê li ser xaka mezapotamyayê çand, ji nû ve xwebûn, ji nû ve kesayet, ji nû ve mêjî ji nû ve vîn û giyan çandin. Bêgûman ev yek tê wateya xwe ji tinebûnê rizgarkirin û derketina ser dikê ya dîrokê ye. Gelê Kurd êdî gihîştiye asteke ku careke din nayê şikandin. Ji ber vê sedemê, di dîroka gelê Kurd de 27’ê Mijdarê weke roja vejînê ye.”

**‘Em ê bi fikir û felsefeya Rêber Apo bi serbikevin’**

Mehsûm Hesen di dawiya axaftina xwe de da zanîn ku PKK`ê partiya Şehîdan û rûmetêye û got: “Sersala damizrandina PKK`ê sersala hebûn, vejîn û azadiya gelan e, roja hişyarkirina gelê kurde. Em ê bi fikir û fesefeya Rêber Apo tekoşîne xwe berdewam bikin û li ser riya şehîdên xwe berxwedaniyê bidomînin û azadiya fîzîkî a Rêber Apo pêk bînin.”

**‘Ev destan destana vejînê ye’**

Di heman mijarê de Hemo Bedir jî wiha axivî û got: “Gelê Kurd bi Tevgera Azadiyê ya Kurd re ji nû ve vejiya. PKK`ê ji bo parastina hebûn û azadiya vî gelî têdikoşe. Ji bo azadî û serketinê hem ji gelê Kurdistanê hem jî ji cîhanê re dibe mînak. Ev yek jî bi ked, hewldana bi salan a Rêber Apo pêk hat. Her wiha em di sala 50’î ya meşa Rêber Apo ya ber bi azadiyê de ne. Têkoşîna Rêber Apo meşeke azadiyê ya bêhempa ye. Li bendê bûn ku lawaz bibe, têk biçe, lê roj bi roj mezin bû, bedew bû û gihîşt vê astê. Ne tenê ji bo gelê Kurd û Kurdistanê bû. Dema ku mirov rewşa dawî binirxîne, bûye têkoşîneke enternasyonal û ji ailyê azadîxwazên cîhanê ve hatiye pejirandin. Rêber Apo û PKK’ê bi îradeyeke mezin pêk anîn. Yek ji nirxên herî pîroz ên vê rêwîtiya têkoşîna azadiyê li Rojavayê Kurdistanê gihîşt asta herî bilind. Ev têkoşîn tenê bi destanekê dikarîbû bihata vegotin. Dîroka gelekî li ber tunebûnê bû, lê ji nû ve vejiya, tenê bi destanekê dikarîbû bihata vegotin. Ev destan destana vejînê ye.”

# ‘Em ê asta têkoşîna li dijî tundiya li ser jinan bilintir bikin’

**Ronahî / Qamişlo**

**Rêvebera Rêxistina Sara ya têkoşîna li dijî Tundiya li ser jinan diyar kir ku ew ê asta têkoşîna li hemberî tundiya li ser jinan bilintir bikin, herwiha bang li rêxistinên jinan yên navneteweyî kir ku li hemberî sûcên dewleta Tirk û çeteyên wê yên li dijî jinan bêdeng nemînin.**

Em di serdeme şerê pergalê de dijîn, di vê serdemê de li dijî jinê rewşeke şer heye ku nehatiye ragihandin. Bi sedê salan e ku tundiya baviksalarî derketiye meydanê. Her roj bi sedan jin ji hêla mêr ve têne kuştin. Her deqe tacîz û tecawîz li ser jinê dibe. Her kêlî tundî li ser bi hezaran jin dibe. Hişmendiya mêtinger, baviksalar heye ku jinê dike milk. Vê hişmendiyê xwe bi rengê pergala gerdûnî rêxistinî kiriye. Li hemberî tevahiya cureyên şidet û tundiya li ser jinê, 25’ê Mijdarê weke Roja Cîhanê ya Têkoşîna li dijî Tundiya li ser jinê hat ragehandin. Her sal rêxistinên jinan yên cîhanê bi boneya vê rojê û ji bo bîranîna xwîşkên Mîrabalê, herwiha li dijî tundiya li ser jinê çalakiyên mezin li dar dixin.



Bi buneya 25`ê Mijdarê roja tekoşîne li dijî tundiya li ser jinê Rêveberiya Rêxistina Sara ya li dijî tundiya li ser jinê Arza Temo ji rojnemeya me re axivî. Arzo Temo di destpêka axaftina de diyar kir ku 25`ê Mijdarê roja cîhanî ya têkoşîna li dijî tundiya li ser jinê ye, li tevahiya cîhanê di vê rojê de jin li dijî tundiyê çalakiyên cur bi cur li dar dixin û got: “Em wek jinên bakur û rojhilatê Sûriyê, têkoşîna me ya li dijî tundiya li ser jinê di asteke bilind de tê meşandin. Wekî Rêxistina Sara her sal ji bo pêşwazîkirina vê rojê em hazirtiyan dikin, îsal jî bi boneya 25’ê Mijdarê me pêngavek da destpêkirin. Di 5’ê Mjidarê de me bi daxuyaniyekê pêngava xwe ragehand, pêngava me jî rêzeçalakî ne. Destpêkê em ê wekî panêlekê derbarê vê rojê li dar bixin, panêl jî wê di nabera Rêxistina Sara û Meclisa Jinên Olî de li ser du mijaran bê li dar xistin. Herwiha wê nerînên jinên civakê li ser vê rojê bên girtin.”

**Çalakî**

Arzo axaftina xwe wiha berdewam kir û got: “Wê semîner ji jinan re bên dayîn, tê de wê sedema tundiyê bê nîqaşkirin. Wê semîner bi zimanên kurdî û erebî bin. Herwiha wê meşek meşeleyan ji aliyê Rêxistina Sara û Rêxistinên Jinan bê li darxistin, ev meş jî bi armanca piştgiriya bi jinê re li dijî tundiyê ye. Di meşê de wê li ser nepoxan navên jinên şehîd bên nivîsandin. Herwiha biroşûr derbarê vê rojê de wê bên belavkirin û semîner jî bên dayîn. Derbarê vê rojê de wê li Kobanê, Sirîn, Heleb, Yên Îsa, Hesekê û hersî kampên Newroz, Waşokanî û Newroz wê filêks derbarê 25`ê Mijdarê de bên dalwqandin. Li her devrên bakur û rojhilatê Sûriyê bernameya me hevbeşe. Herwiha 25`ê Mjidarê em tevlî meşa giştî jî dibin.”

**‘Pêwîste jin li dora zagonên Rêveberiya Xweser yên ji bo jinê bibin xelek’**

Arzo Temo da zanîn ku di dema dawî de di sala 2023’an de bûyerên kuştina jinan zêde bûn, herwiha li hemû cîhanê tundî berdewam e û wiha domand: “Ev tundî di salên dawiyê de zêdetir bûne. Li dijî tundiyê divê li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê zagonên ku Rêveberiya Xweser li dijî tundiyê danîne, werin bicihkirin û pêkanîn. Niha li herêmên Rêveberiya Xweser bûyerên kuştina jinê û tundiya li dijî wê ji yên herêmên dagirkirî û yên di bin kontrola hikumeta Şamê kêmtirin. Sedema wê jî ji ber Rêveberiya Xweser li dijî tundiya li ser jinên zagon danîne û ev zagon tên pêkanîn. Lê niha tişta ku zêdetir tê xwstin ew e ku li dijî tundiyê û kuştina jinê civak bê pêşxistin û xwe zane bike. Ev jî bi semîneran û çalakiyên cûda pêkan e. Herwiha di nava malbatê de divê çanda wekheviya herdû cinsan bê çandin. Divê herkesê ku li dijî zarok û jinan sûcan bike, zagon li ser wan bên pêkanîn da ku bi van zagonan rê li ber tundiyê bê girtin. Divê zagonên Rêveberiya Xweser ji sedî sed bên pêkanîn, divê tevahiya jinên bakur û rojhilatê Sûriyê zagonên jinan yên ku hatine danîn, biparêzin û li dora van zagonan bibin xelek.”

**‘Divê jinên cîhanê rastiya kiryarên dagirkeriya Tirk eşkere bikin’**

Rêveberiya Rêxistina Sara ya li dijî tundiya li ser jinê Arza Temo wiha dawî da axaftina xwe û got: “Bangoziya me ji hemû jinên cîhanê yên di mjiara parastina mafê jinê de çalakin ku li hemberî kuştina jinan li herêmên dagirkirî yên di destê dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê de, bêdeng nemînin, divê rêxistinên jinan yên navneteweyî derbasî herêmên dagirkirî bibin û sûcên li dijî jinan tosîq bikin, herwiha divê dagirkeriya Tirk û çeteyên wê li ser sûcên ku li dijî jinan dikin bên darizandin. Dewleta Tirk û çeteyên wê bi 100’an jin revandine, destdirêjî li wan kirine û kuştine, divê jinên cîhanê vê rastiyê ji raya giştî ya cîhanî re eşkere bikin.”